

Vaksîneya Vîrûsa Korona

Vaksîna Kovîd-19 AstraZeneka (AstraZeneca)

Agahî ji bo wan kesan ku ev vaksîne ji wan re tê radest kirin.

Korona vîrûsa nû dibe sedema enfeksiyona dezgeha nefesê. Gelek kes nîşanên sivik yan bêy nîşan tecrûbe dikin, lê dibe ku hin kes bi giranî nexweş bikevin. Kesên pîr û kesên ku berê nexweşiyên din ên taybetî hene, di bin rîska nexweşiya giran an mirinê de ne. Armanca vaksîneya korona parastina jiyana û tenduristiya merovan e.

Divê kî vaksîneya vîrûsa korona bistîne?

Kesên ku ji wan re têne pêşniyar kirin ku bi rêya Bernameya Niştimanî ya Vaksîneyê vê vaksîne bistînin dê li gorî rêzê û gava ku dora wan bigehê vê vaksîne bistînin.

Ev vaksîne belaş e û lêdayina wê vebijarkî ye. Vaksîn dê radestî kesên li Norwêcê dijin bibe.

Ez çawa dikarim vaksîneyê bistînim?

Ji bo bidestana agahdariyan li ser kesên ku têne vaksîn kirin, çawaniya organîze kirina vaksîneyê û dema pêkanîna vê, serdana malpera şaredariya xwe bikin.

Vaksînekirin çawa pêk tê?

Vaksîne di milî de tê lêdayin. Hûn ê du dozên vaksîneyê herî kêr 9-12 hefteyan paşev bistînin. Divê doza duyemîn di dema destnîşankirî de were lêdayin. Berî ku hûn vaksîne bibin, dê ji we were pirsîn ka hûn baş in û ka li hember vaksîneyên din ên ku we vergirtine qet we bertek hebûne yan na. Eger we ji her tiştî re alerjî heye yan hûn ducanî ne, dermanan dixwin, an jî pirsgirêk an nexweşiyên we yê din hene, hetmen me agahdar bikin. Di rewşa nexweşiya giran û taya zêde ji 38°C an, vaksîne dê bi gelemperî dereng bikeve. Piştî ku vaksîne tê dayîn, ji we tê xwestin ku hûn 20 deqîqeyan bisekinin.

Ev vaksîne çawa dixebite?

Ev vaksîne vîrusek bêxeter (vîrusa sarlêdanê) bikar dîne ku erka wê alîkarî ji veguhestina şewennameyên komikên li ser vîrusa koronayê ye ku derbasî laş bibe. Leş kopiyên van komikên ku pergala parastinê dikare li ser wan bixebite, hilberîn dike. Bi vî rengî, pergala parastinê hîn dibe ku komikên koronavîrûsê nas bike û ger laş bi vîrûsê bikeve dikare xwe biparêze.

Vîrûsê veguhestî nikare di laş de zêde bibe û zû bi zû têkdiçe. EV vaksîne nikare bibe sedema korona vîrus an jî nexweşiyek din a enfeksiyonê. Vaksîna koronavîrûsê ji bo pêşgirtina li nexweşiyê tê bikar anîn. Wekî encamek, ew nikare nexweşiyê derman bike.

Ev rêbaza hilberîna vaksîne niha di vaksînen Ebola tê bikar anîn.

Ev vaksîn dê çiqas bi bandor be?

Ev vaksîne laş li hember nexweşiya bi sedema korona vîrûsa nû, diparêze. Di lêkolînên li ser vaksîneyê de, du hefte piştî lêdayina dozê duyemîn, di nêzîkî %60 ji kesên ku hatine

vaksîn kirin, parêzbandî pêk tê. Lêbelê, wusa xuyabû ku eger navbera derziya van her du dozên 9 hefte an zêdetir be, dê ewlehiyek bêtir hebe. Lêkolîn nîşan dide ku ev vaksîn di heman demê de li dijî tîpa girana nexweşiya Kovîd-19 ku pêdivî bi dermankirina nexweşxaneyê dibe jî diparêze. Em hîn jî nizanin dê ev ewlehî heya kengî bidome. Eger bi derbasbûna demê de parêzbandî kêmtir be, dibe ku dozên bîranînê hewce bibin. Ji ber ku vaksîn pêşî li nexweşiyê digire, ew ê pêşî li veguhastinê jî bigire, lê em hîn jî nizanin ka ev vaksîn dê heta çî astê pêşî ji veguhastina vîrûsê bigire. Ji ber vê yekê, divê herdem pêşniyarên heyî li ser kontrolkirina nexweşiyê bişopînin.

Bandorên kêlekî

Ji lêkolînên pêkatî, me agahiyên baş li ser bandorên kêlekiyê hevpar û kêmtir hevpar di nav kesên ku hatine vaksîne kirine, de dîtîn. Em nekarin bandorên kêlekî yê kêmtir an bandorên kêlekî yê ku paş maweyekî piştî vaksîneyê ji bo cara yekem xuya dikin, negengaz bizanin. Piraniya bandorên kêlekî piştî vaksîneyê di çend rojên pêşîn de xuya dikin û di nav çend rojan de namînin:

- Nivî kesên vaksînekirî êşê li cihê vaksîneyê ragihand.
- Bandorên din yê hevpar pêktên ji nexweşî, mandîbûn, serêş, êşa masûlkeyan û endaman, hejîn, dilrûbûn û tayê
- Ev bandorên kêlekî piştî vaksînekirina doza 2 yê kêmtir û siviktir in.

Di piraniya rewşan de, bandorên kêlekî sivik an navgîn bûn. Kêmtir ji %5 ji wan bandorên kêlekî acizker hatine ragihandin ku bê zîzar bûn lê di nav çend rojên ku bandor hebûn, bandor li jiyana wan a rojane kiribû.

Eger min bandorên kêlekî hebin, divê ez çî bikim?

Eger tûşî bandorên bêhêvî, giran an demdirêj bûn ku hûn difikirin ku ji ber vaksîneyê ne, ji bo nixandî û şîretkirinê bi doktorê xwe an bi pisporekî din ê lîstîkê tenduristiyê re têkiliyê daynin. Pisporekî lîstîkê tenduristiyê berpirsyare ku her bertekên tûnd an bêhêvî yê ku ew guman dikin ku ji ber vaksîneyê ne, ragihîne. Wekî din, hûn bixwe dikarin bi rêya [helsenorge.no](https://www.helsenorge.no) agahdariyek bişînin.

Erêkirina bişert

Vaksîneya korona vîrûs di lêkolînek mezî de ku tê de çend hezar kesên vaksîne wergirtin hate ceribandî. Ev lêkolîn bi eynî şêweya vaksîneyên din pêk hat, lê dema çavdêriyê di vî de kurttir e. Rayedarên çavdêr li ser demanan ji vî vaksîneyê re erêkirina bişert dayine. Bi gotinên din, têra xwe dane hene ku nîşan dike ku sûdên vî vaksîneyê ji riskên vî zêdetir in, lê hilberînerê vaksîneyê divê lêkolînan bidomîne û her gav ku daneyên nû peyda kirin, bi domdarî wan pêşkêşî rayedarên çavdêr li ser dermanî bike.

Min kîjan vaksîne wergirtiye?

Demê ku vaksîneya korona vîrûs ji were radest bibe, ew ê li Nivîsgeha Qeyda Parêzsaziya Norwêcê, SYSSAK, were qeyd kirin. Hûn dikarin li [helsenorge.no](https://www.helsenorge.no) agahdariyên xwe bidest bînin.

Hûn agahdariyên bêtir dixwazin?

Ji kerema xwe ji diktorê xwe an jî pisporekî dinê tenduristiyê yê bipirs bipirin an jî herin ser malpera Enstîtuya Tenduristiyê Giştî ya Norwêcê li ser [fhi.no/cvp](https://www.fhi.no/cvp).